*NAVEND -*
*Zentrum für Kurdische Studien e.V.*
*Navend ji bo Lêkolînên Kurdî*
*Center for Kurdish Studies*
*Centre des Etudes Kurdes*

**Geschäftsstelle**
Bornheimer Str. 20-22
D - 53111 Bonn

Tel.: +(0)228 / 65 29 00
Fax: +(0)228 / 65 29 09

**Postanschrift**
Postfach 74 45
D - 53074 Bonn

**e-mail**:info@navend.de
**Internet**:www.navend.de

**Bankverbindung:**
Sparkasse Bonn
(BLZ 380 500 00)

NAVEND e.V.
Konto-Nr.: 310 206 13

**Daxuyaniya Çapemeniyê**

**Bonn, 07.04.2005**

# Birêz Celal Talabani wek Kurdê yekem ji bo *Serokkomariya Êraqê hat* hilbijartin

*Di derbarê hilbijartina Birêz Celal Talabanî, Sekreterê Gîştî ye Yekîtî Nîştimanî Kurdîstan (YNK), de daxuyaniya Serokê NAVEND-Navend ji bo lekolînên Kurdî`ê (NAVEND - Zentrum für Kurdische Studien e.V.) Metin Incesu:*

"Ji bo jin û mêrên Kurd li her çar parçên cîhanê -ne tenê ji bo vê yekê jî- ev roj, rojeke dîrokî ye. Demekê pêş niha sîyasetmedarekî bi serpêhatî û ezmûnê wek Birêz Celal Talabanî ve û ev nêzîkî 60 salin ji bo azadîya gelê Kurd têdikoşin, bibe Serokê Êraqê xewnbû. Ji bo vê yekê jî, ji di13 salîya xwe de beşdarîbûyîna we komeleka nêhînî a xwendekaran heta damêzrandina YNK li sala 1975 û Sekreterê Gîştî ê YNK'ê û Hilbijartinên Parlemana Herêma Kurdistanê û damêzrandina Hukumeta Kurdistanê (1992) û dewra giring ku we di azadkirina demokratizekirina Êraqê de lîst heta niha.

Niha derfeteka dîrokî peyda bûye, ew kari bibe nimûne ji bo aşitîyê, demokrasîyê û pêşvebirina civakê li Rojhilata Navîn û Nêzîk û kargerîyekê li ser bûyerên deverê bike.

Hilbijartina Birêz Celal Talabanî ji bo vê postê, ê kargerîyek mezin ji bo hêzkirinê li ser Tevgera Kurd li Kurdistana Başûr û parçên din ên Kurdistanê bike. Hilbijartina Birêz Celal Talabanî ji bo vê postê, ê daxwazên gelê Kurd ê Başûr ji bo demokrasîyê, federalîzmê, mafên mirov, dewleta dad û yasayê, tolerans û wekhevîyê gaveke din pêş bixe. Em hêvîdarin ku ev maf û nirxên bingehî di hemû cih û waran de li Êraqa nû de cihbicih dibin. Dîsan em hêvîdarin ku ew deverên Kurdistanê, ên ku heta niha li ser Kurdistanê nînin, di demeke kurt de vedigerin li ser Kurdistanê."